DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

**https://rantey.org**

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

A. PUŞKÎN

# MASÎVANÊ KAL Û MASÎYÊ SOR



Kurdîya wê : Hazım KILIÇ

Weşanxana XANI & BATEYI

Wêne : Ji pirtûka orîjînal ya rusî hatine wergirtin
[Detckaya Literatura / Leningrad - 1984]

**© Weşanxana XANİ & BATEYİ**
**Nr. Weşanê : 1**
**Rêza edebîyatê : 1**
**1989/İlon**
**ISBN 87-983307-0-5**

**Mizanpaj : Süleyman ŞADİ**
**Berg : Rûken K.**

Edîtor : Elkî HEKARİ
**Postboks 39**
**2660 Brøndby Str.**
**DANMARK**

*Çap: Çapxana ORTADOĞU/ Berlina Rojova Tel.: 692 39 99*

Aleksandr PUŞKÎN

# Masîvanê Kal

# û Masîyê Sor

Kurdîya wê : **Hazım KILIÇ**

**Weşanxana XANÎ & BATEYÎ**

**1989**

Demek ji deman li lêva okyanusa şîn û kûr
Masîvanekî kal digel jina xwe dijîya.
Di kolkekî kevin da rîs dirêsa jinikê
Masîvan jî ev sih sal bû ku havîn û zivistanê masî digirt.

Mirovi rojekê ji zû ve tora xwe avête deryayê
Tor bi xîzê kûraya ve tijî bû
Cara duyan ji kezê pê ve tiştek bi dest neêxist,
Di cara sêyemîn da destên wî vala neman;
Di nav torê da masîyekî sor hebû.




Masî devê xwe vekir û wekî mirova axift:
"Kalo, min paşda bavêje nav deryayê
Tu çi dixwazî, divêy ez'ê bidim te"
Lê belê kalo gelek tirsa
Heta wê rojê qet rastî masîyekî ku diaxive ne hati bû
Hêdika tor vekir û ev masîyê ecêp ji nav torê rizgar kir.

"Bijî masîyê piçûk, tiştekê naxwazim
Vegere mala xwe, bijî, bigere û keyfê bike."




Piştî van gotina bi bez çû mala xwe
Ji jina xwe ra behs kir û her dilgeş bû:
" Te bidîta çi masî bû
Lap wekî mirovekê diaxift
Çi tiştê min bixwesta wê daba min
Lê belê bertîl wergirtin qet bi kêrî min têt?
Bê bertîl min azadî dayê."

Jinik pir hêrs bû li ser van gotina
Qîrya ser; " Gêjê,mejî reş!
Keysê ku derketîye pêşîya te, te revandîye
Ka binêre vî halê me yê perişan,
Binêre vê legena ji hev ketî,
Here qet nebe legenekê jê bixwaze bo mala me."




Kalo vegerya lêva deryayê,
Pêlên şîn dileyizîn di bin ronahîyê da
Bi dengekî bilind bangî avên bê bin kir,
Ecêp, masî hema dengê wî bihîst:
" Çi dixwazî kalo ka bibêje?"
Kalo got: " Li qisûra min nenêre masîyê esilzade,
Jina min beyhude gelek li min heytand
Ketîye rikê dibêje illeh legenek."
Masî got: " Bêhna xwe teng neke here mala xwe
Tu dê legena xwe bibînî, qet xemgîn nebe."



Masîvan bezî mala xwe, lê çi bibîne
Legena nû û jina wî li ber derî ne,
Lê belê jinik vê carê pitir qîrya
" Gêjo, evdal ma te tenê legen xwest
Zû dîsa here nik masî
Xanîyekê bixwaze şûna vî kolki."




Bezî ber lêva deryayê, masîvan
Derya vê carê pir bi pêl bû,
Bi şermînî dîsa bangî masî kir
Masî hema zû hat:
" Çi dixwazî kalo?"
" Li qisûra min nenêre masîyê esilzade,
jina min bi hêrsa ketîye
Ji ber vê çendê hatim ber derê te
Şûna kolki, xanîyekê dixwaze."
" Mereqê neke, xemgîn nebe, here mala xwe
Ez'ê dîsa alîkarîya te bikim."



Kalo wextê zivirî
Dît ku xanîyekî boye kirî,
Banê wî bi kîremîtên sor dibiriqe.
Jina wî di pencerê da li benda wî bû
Dîsa diqîrya:
" Bê mejî, ma te tenê xanî xwest
Xanî dê bi kêrî çi bêt, hindî ku em gundî bin
Ez dixwazim bibim esilzade, têbigihe
Here zû, bêje masî."



Kalo ber bi deryayê ve bezî
Pêlên deryayê bilind û har bibûn
Kire gazî ber bi deryayê ve:
Masî ji nişkê ve xûya kir;
" Vê carê çi dixwazî masîvan?"
" Di min bibore masîyê esilzade,
jina min hêsa nasekine
Hizûrê nade min,
Niha jî ji gundîtîyê aciz bûye
Dixwaze bibe esilzade."
Masî go:
" Xemgîn nebe masîvan, vegere mala xwe
Jina te dê bibe esilzade
Dê bigihe mirada xwe."



Masîvan bezî ber bi mala xwe ve, lê çi bibîne
Di şûna xanî da koşkek xûya ye,
Jina wî ya pîr xwe spartîye stûna mermer
Libasên spehî li ber

Pora wê bi zêr hatîye hûnandin
Li ser singê wê rêz rêz ristikên mirarî
Di destan da gustilkên bi yaqut
Fermana dibarîne ser xulamên xwe
Masîvan wisa pepûk pepûk xwe nêzîkî wê kir
Silavek da vê xanima esilzade:
" Roj baş xanima min ya esilzade, hêvî dikim tu dilşa yî
Talîyê tu gihiştî daxwaza xwe."
Jinê gotê; " devê xwe bigre:
Ji îro pê ve tu dê di govê da bixebitî."



Heftî li dûv heftîya derbaz bûn.
Pîrejin êcarî qure bû,
Spêdekê zû mêrê xwe da gazî kirin
Gotê; " Here wî masî bibîne
Esilzadeyî têra min nake êdî,
Dixwazim bibime Keyban."

Masîvani şaş mehtel berê xwe dayê;
" Jinê te aqlê xwe berze kirîye?
Hêj tu wekî esilzadeyekê naaxivî
Dixwazî bibîye Keyban
Timamî welat dê bi te bikene."
Jinikê êcarî xwe har kir
Zeleyek dijminane li mêrik da:
" Tu kî yî heta têkilî min bibî
Bi cehneme ji vê derê, heke ez'ê serê te bişkênim."

Masîvan neçar çû lêva deryayê,
Derya her bo her difûrya
Bi şermînî, gazî masî kir,
Masî got: " Çi dixwazî kalo?"
" Niha jî dixwaze bibe Keyban
Eve eşkereye ku dîn bûye."
Masî got: " Xemgîn nebe, başe
Ez dê wê bikim Keyban, mereqê neke."



Masîvan bi lez çû nik jina xwe
Lê çi bibîne, qesreke mezin!
Jina wî ya pîr û har
Wekî Keybanekê li ser texti
Li dora wê, xulam û esilzade rêz bûne
Şerabê tijî qedeha wê dikin
Kadeyên têr tam dixwin.
Bi çokên lerizî xwe li ber çemand
Gotê: " Roj baş Keybana min, hêvî dikim tu dilşa yî
Talîyê tu gihiştî xwezîya xwe."



Lê jinê berê xwe jî nedayê
Ferman da xulamên xwe ku wî ji wê derê bavêjin:
" Ev mirovê lewitî kî ye,
Zû wî bavêjin ber deri."

Bi vî tehrî roj û heftî derbaz bûn
Rojekê hatin ji nişkê ve mêrik dîsa birine qesrê.



Vê carê jî jinê digot,
" Ez êdî ji Keybanîyê jî aciz bûm, eve jî têra min nake,
Dixwazim bibim hakima deryan,
Di nava derya da divê qesreke cam ji min ra bête çêkirin,
Ew masîyê bi hûner jî divê bibe xulamê min."

Masîvani ji tirsa nikarî tiştekê bike
Nikarî devê xwe veke ji lerizînê
Dîsa kete ser rê,
Dît ku ba û bagereke mezin
Derya har bûye...



Destên xwe bilind vekirin û bangî ava kir
Masî ji nişkê ve derkete ber.
" Çi dixwazî kalo, derdê te çîye?"
" Di min bibore masîyê esilzade, ez dîsa hatim
Jina min ji Keybanîyê aciz bûye
Niha jî divêt bibe hakima hemû derya
Herkes wê jê ra bibin kole û xulam.
Qesreke cam dixwaze di nîveka derya şîn da;
Te jî ji xwe ra dixwaze bike xulam."

Masî vê carê qet qeseyek ne got
Kurya xwe rakir û winda bû
Di nav derya şîn da berze bû çû.
Wextê deng ji masî derneket,
Masîvan ber bi qesrê ve vegerya.
Lê belê çi bibîne...
Di şûna qesrê da kolkekî xirabe
Û jina wî di nav libasên xwe yên kevin da
Li ber legeneke kevin rûniştibû...



